

# kurdnasîn

Nisan/Heziran 2002

Hejmar: 1 Sal: 1


- *Kurtebirek ji diroka KOÇ-KAK*
- *Zimanek hînbûn û zimanê zikmakî*
- *Di meslekê ciwanan de rola dê û bavê*
- *Azadîya keç û kur ya di nav malbatê de*



Geschiedenis van KOÇ-KAK



Allochtonen en  
Politiek





## NAVEROK/INHOUD

Derketin	5
Kurtebirek ji diroka KOÇKAK	7
Zimanek hînbûn û zimanê zikmakî	9
Di meslekê ciwanan de rola dê û bavê	11
Di nav malbatên kurdan de bi gelemperî azadiya keç û kuran	13
Voorwoord	15
Geschiedenis van KOÇ-KAK	16
Allochtonen en Politiek	19
Grammatica	25

Kurdnasîn organa KOÇ-KAK é ye.  
u ji sê mehan careke derdikeve.

Kurdnasîn is een uitgave van KOÇ-KAK  
Kurdnasîn verschijnt 4x per jaar.

### **Redaksiyon / Redactie**

B. Baran

Leyla

Ferhat

### **XEbatkar / Medewerkers**

X. Uso

Brûsk

Rojin

Zelal

### **Pergela Rupelan / Grafische Vormgeving**

Şefik

Mehmet

Adar

### **Navnişana Redaksiyonê / Redactie Adres**

KOÇ-KAK

Klarendalseweg 468

6822 GW Arnhem

### **Navnişana Postê / Post Adres**

KOÇ-KAK

Postbus 1092

6801 BB Arnhem

### **E-mail**

kockak@nistiman.com

redactie@nistiman.com



## DERKETIN

Xwendevanên hêja û bi rûmet,

Ji bona hebûna xwe biparêzin, bidomînin û pêş bixin pêwistîya her rêxistin û civakî bi xebatên pir cûre heye. Tiştêk xwezayî ye ku her rêxistin û civaka heyî li gor rewşa xwe di nav xebatek de ye. Heta pêwistî bi wê rêxistin û civakê hebe wê xebat û tevgerêk jî ji bona wê rêxistin û civakê bê kirin, li gor wê xebat û tevgera ku ji wê rêxistin û civakê re tê kirin jî wê ew rêxistin yan civak hebûna xwe bide jîyandin û bidomîne. Lê gava ew xebat û tevgera ku ji bona wê rêxistin û civakê tê kirin têra domandina jîyandina wê neke, wê demê ew rêxistin yan jî civak jî wê nemîne.

Dem her ku dubuhure, pêwistîyên jîyanê yên nû jî bi xwe re tîne. Ev rastî ya hanê ji bona kesek, civatek yan jî rêxistinek yanê ji bona her hawên jîndarîyê jî derbas dibe. Di roja îroyîn de jî; ji bona rêxistinek hebûna xwe bidomîne di nav kar û tevgerên heyî de giranîya weşanê gelek girîng e û her diçe ev girîngî bêtir dibe.

Ji ber vê rastîya hanê Komela me; Komela Çanda Karkerên Kurdistan li Hollanda (KOÇ-KAK) jî di warê weşanê de êdî nikaribû bi hawê berê xebata xwe bidomandana. Wê pêwist dît ku ji niha û pêve giranîyek bide weşanê, da ku karibe xwe bi civaka xwe û civaka derdora xwe bêtir bide nasîn. Ji bona ew karibe helwest û tecrûbên xwe bi kurdên din re karibe parve bike pêwistîyek mezin bi weşanê heye. KOÇ KAK ê di warê weşanê de gava pêşî bi vekirina rûpela internetê "nistiman.com" ji bona ciwanên kurd amade kirinê havêt. Niha jî KOÇ KAK, bi vê kovara demsalî ya di destên we de jî, li gor hêza xwe gavek din davêje.

Naveroka KURDNASÎNÊ wê bi giranî li ser agadarîyan be. Ewê him xebatên komelê têde cî bigirin û him agadarîyên li ser rewş û buyerên ku ji xwendevanên me re girîngbin bicî bibin. Ji alîyê din ve, wê Kurdnasîn di nav rûpelên xwe de cî bide maqale û şîrovên civakî yên bi welat û netewa me ve têkilî heyî jî. Wek tê zanîn li Hollanda guherandinên qanûnî û polîtîkayî de tîne kêr bi gelek zimanan tîne belav kirin da ku civakên biyanî baş hayî ji van guhertinan agadar bibin. Lê mixabin ji bona civaka kurd bi zimanê kurdî nayên belav kirin. Kurdnasîn wê li gor hêza xwe di rûpelên xwe de cî bidin van agadarîyan jî. Kurdnasîn wek pîrensîb wê nivî kurdî û nivî jî hollandî be. Lê li gor rewşê carna dikare hinek rûpelên zimanek kêmtir yan jî bêtir bin.

Em wek komel ji bona derxistin û pêş xistina vê kovarê hêvîdarin û bi biryarin. Emê li gor karinîya xwe bixebitin ku kovarek li ser giranîya ragihandinê û her ku here bi naverokek dagirtîr bixwazin derkevin ber we. Lê pêwiste ku ev rastîya hanê jî qet ji ber çavan neyê rakirin ku; jîyandin û domandina kovarek bi helwest û piştgêrîya xwendevanên xwe ve girêdayî ye. Di vî warî de em hêvî darê xwendevanên xwe ne ku xwedî li kovara xwe derkevin. Ji alîyê hest û helwestên xwe, agahdarîyên derdora xwe ji kovarê re bişeyinin, kêmasîyên kovarê vekirî rexne bikin, kovarê bixwînin û bi derdora xwe bidin xwendin.

Em ji niha de sipasî û kêfxweşîya xwe ji bona alîkarîya we pêşkêş dikin, serkeftin û serfîrazîya we dixwazin.

REDAKSIYON



## KURTEBIREK JI DÎROKA KOÇ-KAK Ê

Sal 1985 em çend hevalên ku lînerînên wanên îyasî yê hevbeş bûn wek penaber hatin Hollanda. Egerên hatina civaka kurd li Ewropa di rû de gelek cure ye. Dîroka hatina Ewropa ya kurdan kevne. Ev her du mijar jî her yek bi serê xwe girîngin û pêwiste em pêş de, di rûpelên xwe de cî bidin van mijaran. Lê niha ez dixwazim gelek kurt rewşa demajoya avakirina Komela Çanda Karkerên Kurdistan li Hollanda KOÇ-KAK ê û kurte çîroka wê bixim ser kaxiz.

Carek di ser hatina nîrê dîktatorîya leşkerî ya 12 îlonê de demek kurt buhurî bû. Êş birînên vê dîktatorîyê li ser civaka Kurd gelek teze bû. Her çend Kurdên li Ewropa û bi hawek taybet kurdên li Hollanda ji berya vê nîrê leşkerîyê de li van welatan bûn. Lê ji aliyek girêdan û hestên civaka kurd; çî zordarî û pirsgirêkên welat sererast bandora xwe li ser kurdên li Ewropa dikin. Her Kurdekî ku li Ewropa dijîyan bi hindikayî merivek wan ya di zindanan de bûn yan jî dibin îşkencande buhurîbûn. Ji ber vê rewşê bi xwe, hestek xas û pêrejî tevgerî û lêgeryan jî di nav civaka Kurd de gelek xwurt bû.


Civaka kurd him li tevayîya Ewropa û bi taybet li Hollanda jî dinav civakên biyanî de civakek gelek fire bû û niha jî weha ye. Lê mixabin bi giranîya xwe ve civaka kurd ji rêxistinî bêpar bû. Di tevahîya Hollanda de çend komel hebûn. Civaka kurd bi giranî bi karkerî û bi rewşa zewac û yekbûn kirina malbatî hatibûn. Hema bêje nêzikê tevahîya wan ji Kurdistanê Bakur hatibûn. Ji bona pêwistîyên xwe yê civakî bi giranî di nav rêxistinên tirkên de bûn û ji bona pirsgirêkên xwe jî bi giranî di nav rêxistinên tirkên de li çareserîyê digerîyan.

Di nav vê rewşa hanê de huvde (17) sal berî niha me Komela Çanda Karkerên Kurdistan li Hollanda (KOÇ-KAK) ava kir.

Xebata herî berbiçav di sala pêşî ya komelê de; bi du komelên din yê Kurd re ava kirina NAVENDA KURDISTAN (Kurdistan Centrum) bi hawek fermî bi vekirina Serokê Beledîya Arnhemê bû. Di wê demê de polîtîka Beledîya Arnhemê ew bû ku; ji bona her civatek biyanî yê ku li bajarê Arnhemê dijîn re navendek amade bikin da ku komelên wan civakan karibin karên xwe li wê bi asanî pêk bînin. Di warê civaka kurd de valayî û dijberîyek nexweş hebû. Bi avabûna KOÇ-KAKê û xebata wê ya gelek aktîf ve vê rewşa tevlihev ji holê hat rakirin û Navenda Kurdistan bi serbilindî hat damezrandin. Di sala 1996 an de polîtîka Beledîya Arnhemê di vî warî de hat guhertin û navendên civakî yê biyanîyan hemî hatin girtin... Bi vekirina Navenda Kurdistan ve amade kirina pirtûkek agadarîyê li ser kurtedîroka Kurdistanê û rewşa civaka Kurd li welat û li Hollanda, li wê demê bi kurdî û hollandî amade kir û çap kir.

REDAKSIYON

Dîsa di sala 1985 an de xebatek din jî, li Hollanda ava kirina komek folklorê Kurd bû. Ev bi xwe li Hollanda, di warê folklorê Kurd de dagirtina valayîyek mezin pêk hanî. Vê xebata folklorê Kurd bi xwe jî, piştî demek bû bîngehê komek folklorê ku heta niha bi navê KOMA NIŞTIMAN bi sedan car li gelek deverên cuda folklorê kurd pêşkêş kirîye. Heta ne tenê li Hollanda li gelek welatên din yê Ewropa jî folklorê Kurd pêşkêş kirîye û folklorê Kurd bi





civakên biyanî daye nasîn û şêrîn kirin. Dîsa KOMA NIŞTIMAN gelek caran ketîye nav pêşbirkên folklorê ya navnetewî li Hollanda derrecên yekemîn wergirtiye.

Ev buye şûna serbilindayîya civaka Kurd û pêlek baş ji bona nasîna çanda netewa Kurd li derveyî welat.

Dîsa KOÇ-KAK ê di destpêka 1986 an de ji bona zarokên Kurd dest bi dayina dersa zimanê Kurdî kir. Dersa Kurdî du salên pêşî bêyî tu alîkarîyî tenê bi hêza komelê bixwe hat dayin û paşê, dersa Kurdî ji aliyê Beledîya Arnhemê ve bi hawek fermî hat nasîn alîkarîyek fermî ji bona dersa kurdî hat dayin. Ji aliyê KOÇ-KAK ê ve dayina dersa zimanê kurdî ji bona zarokên kurdan heta sala 1997 an hat dayin. Ji ber ku di sala 1997 an de, ji aliyê Wezaretê ve bi navê OALT (Onderwijs in Allochtone Levende Talen) ve dersa zimanê kurdî jî wek dersa zimanê erebî û tirkî ji bona li dibistana bê dayin hat peji-randin.

Êdî vatinîya KOÇ-KAK ê bi serê xwe bi dayina dersa kurdî nema. Dayina dersa zimanê kurdî li gor rewşa hebûna zarûkên kurd, daxwaza malbatên kurdan ji bona zimanê dêmakî belediyên Hollanda ku şert pêkbên li dibistanên Hollanda dikare bê dayin.

Komela Çanda Karkerên Kurdistan li Hollanda (KOÇ-KAK) ji avabûna xwe ve bi pirs û pirsgirêkên Kurd û Kurdistanê ve têkilhev bû. Ji ber rewşa Kurdistanê ya taybet ji xwe rêxistinek kurd li dervayê pirsgirêkên Kurd û Kurdistanê nikare hebûna xwe bidomîne. Ji ber ku gelek pirsgirêkên civaka Kurdên li Ewropa bi xwe ji pirsgirêkên Kurdistanê derketine û çareserkirina wan heta çîyek bi vê pirsgirêkê ve girêdayîye. Ji ber vê jî KOÇ-KAK, ji destpêka xwe ve di nav helwestên siyasî de ye. Helwestên dijberiyên nîrê dîktatorîya leşkerîya 12 îlonê de, helwestên li dijî mêtinkariyê tim cîh girtiye. Di xebatên xwe de li cem tevgera netewîya Kurdistanê ye. KOÇ-KAK tim di nav gelşên pirsgirêkên civaka Kurd ya li Hollanda de aktif e. Ew ji destpêkê de ji bona bi destxistina gelek mafên asankirina rewşa penaberan û hêskirina jîyana penaberîyê gelek kiryarên cuda pêk hanîye û bi rêxistinên biyanîyên din re jî ketîye nav gelek çalakîyên cuda.

KOÇ-KAK ê ji bona ji Kurdan re jî ew mafên ku ji biyanîyên din re li Hollanda hatine nasîn bi dest bixe ketîye nav gelek çalakîyên cuda. Bi hemî partiyên Hollandî û bi gelek avahiyên fermiyên Hollandî re civînên cuda çêkirîye. Ji bona pirsgirêkên civaka kurd li Hollanda gelek semîner, pêşange, şahî û hwd. Amade kirîye, yê amdebûyî de beşdar bûye.



## ZIMANEK HÎNBÛN Û ZIMANÊ ZIKMAKÎ

### B. Baran

Erê di dawî de Tirkîyê "qanûna Wekkirina Yekîtiya Ewropa" derxist. Ev demek dirêj bû ku di navbera desthilatdarên Dewleta Tirkîyê de li ser vê qanûna hanê nîqaş hebûn, pê re jî li ser vê, di nav partiyên Tirkîyê de bihevçûn hebûn. Tevî ew şer û pevçûnên berê xwanê bû ku Parlamentoya Dewleta Tirkîyê ji nişka ve û wek ku qet bihevçûnek di navbera wan de tune be vê qanûna derxist.

Ev bi xwe bi hawek gelek vekirî rûyê wan yê derewîn, şer û pevçûnên bi henekî, pêkenîn û xapandina gelê xwe pêşan dide. Ev aliyek pirsgirêk û nexweşî û dirûtîya Tirkîyê ye. Lê ji bona me, ya herî girîng di nav gelê me de û li ser navê gelê me ev def û daweta piştî vê qanûnê ku li dar ketî ye, ev şahîya ku bêeger pêketî, ev çepikên ku vala li hev ketî ne.

Carek pêwiste ku ev rastîya hanê bêt zanîn ku heta netewa Kurd wek neteweyên hemyayên xwe di her warî de li ser çarenûsa xwe serbixwe û azad nebe, ne pirsgirêka Kurd xilas dibe, ne nexweşî, pevçûn, şer, êş, girî, xizani ji navçê radibe. Ji ber tu avahî bêyî ku li ser hîmên saxlem bê ava kirin li piya namînin. Ji bona hîmên saxlem jî pêwist e ku her kevirek yê hîmê li şûna wê bê danîn. Kurd û Kurdistan hîmek ji hîmên herî girîng yê herêmê ye. Heta ev hîmê girîng neyê sererastkirin, hemî mafên wê nekevin destên wê, ew ji çarenûsa xwe bêpar bimîne tu avayî, tu rist xwe li rojhilata navîn li piya ranagire, tu aşîti û xweşî çê nabe.

Ev gelek vekirî ye ku mijar pir cûre ne, pêwist e ku di her warî de meriv xwedî lînêrînên zelal be. Li vir mebesta me ev e ku bi vê qanûna hanê, Qanûna Wekkirina Yekîtiya Ewropa (QWYE), di warê Kurdan de çi guhertin kirîye? Gelo çi destxistin ji gelê kurd re hanîye? Ev girîng e.

Carek ne divê qanûnê de û ne jî di qanûnek din ya Dewleta Tirk de navê Kurd derbas nabe. Lê çend xalên ku îro pêwendîya wan bi Kurdan ve hey e, yan jî mebest jê kurd tê pejirandin û ji wan re gelek çepik lê dikevin û ahî tê li dar xistin ev in:

Yek jê bêyî dema şer û nêzikê şer rakirina cezayê darvekirinê ye. Ev xal ji ber ku bêyî binavkirinê sererast bi Serokê PKK ê ve tê girêdan, tê rojevê. Ya na heta rewşa Kurd û Kurdistanê ev be rewşa "şer û nêzikê şer" bi giranî bi pirsgirêka Kurd ve girêdayîye û di serhildanên Kurdistanê de li dijê kurdan tim dikare bê xebitandin û wê bê xebitandin jî.

Yeke din jî ev e; XAL 10. Guhertinên di Vatînî û desthilatîyên polêsan de ... "D) Deverên pêşandana lîstikan, pêşandana şanoyan, nişandana film û vîdeoyan û cîhên îzindana weşanên internetê ku zirara wan bigîje yekbûyîna bêparvebûnîya welat û netewetî ya dewletê" ...deverên ku hatine rêzîkirinê ji universîtan, nav dersxanan heta salon, sinema, sendika, komel, kûçe, mal, erebe... yanê her deverên tevayî û kesî ku ew şikê jê bikin, bi stendina kaxizek ji amirê berpîrsîyarê cîh (wek tê zanîn, ji xwe emrê geryanê yê çapkirî û îmzekirî her tim li cem polêsan heye, ger tunebe jî bê egerek jî derxistina wê ji bona polêsan gelek hêsa ye); ser merivan, ereban, cîh, eşya, kaxizên kesî tê geryan... dest li ser eşyayên sûcê tê danîn û ji sawcî re tê şîyandin..."



Yanê ew piçek demokratxwanêkirina Dewleta Tirk jî li dervayê pirsgirêkên bi Kurdan ve girêdayî ye. Di qanûnê de gelek vekirî ye çî lîstik, şano, şahî, filîm, muzîk, internet... hema bi pirsê kurd ve pêwendîya wan hebe navê wê vekirî lê ye "zirara wan digehîje yekbûyîna bêparbûnîya welat û nete-wetîya dewletê" û polês dikare li her deverî û her kesî bigere, dest deyne ser 'tiştên wanên sûcê' ! Yanê hema gava bîna navê kurd jî hebe tu bînfirebûn jî li hember tune. Lê ew çepik û şayî ji çiyê 'demokratbûn û demokrat kirina qanûnê' re ye, ez nizanim.

Xalek din ku wek 'nasîna gelê kurd', 'pejirandina zi-manê zikmakî', 'serbestkirina zimanê kurdî', wek 'şoreşek', 'pêngavek gelek mezin' tê binav kirin jî eve:

"XAL 11. A) Navê Dada 14.10.1983 yan bi nimroya 2923 yan Hînkirin û Perwerdekirina Zimanên Biyanî bi, "Hînkirin û Perwerdekirina Zimanên Biyanî û Hînkirina Ziman û Zaravayên Cuda bi Hevwelatîyên Tirk" ve hat guhertin".

Xal bi xwe sererastkirina hînkirin û perwerdekirina zimanê biyanî û "hînkirina ziman û zaravayên cuda bi hevweelatîyên Tirk" e.

Hawe û hînkirina ziman li alîyek, ew ziman û zaravayên ku bê hînkirinê, bi xwe biyanî ne, lê 'tirk dikarin bî hînkirin', ne ku zimanê dayikî ya hinka li wan tê hînkirin û perwerdekirin. Yanê di qanûnê de ne nasîna zimanê kurdî heye, ne zimanek dayikî heye. Her kesek wek tirkek dikare piştî temenek zimanek din hîn be, lê ew jî tenê di bin rê û rêberî û çarçova dewleta tirk de.

Ev bixwe jî ewçend berevajî ye û ji merivayetiye dere ku, bêyî rêberî û kontrola dewleta tirk, tu nikarî zimanek yan jî zaravayek biyanî jî hîn bibe. Yanê tu alîyek vê û van qanûnan tuneye ku hinek kes li ser navê kurdbûnîyê, yan jî rewşenbîrî û demokratbûnê kêf û şahîyan li darxin, berdevkiya û propaganda vê dewleta mêtinkar, vê dewleta hov û nijadperest bikin.

Di hemî rist û qanûnan de pir yan hindik valahî û elastîkbûnî hene. Her kes, civak, kat, komel van valayî û elastîkbûnan ji alîyê xwe ve dikşîne û wê bikşîne jî. Gelê kurd jî heta niha valahî û elastîkbûnê qanûnên dewletên mêtinkaran ji alîyê xwe ve xwestiye bikşîne û wê ji niha û şûnde jî bike.

Gelê kurd pêwist e ku her firsendek piçûk jî bibîne jê sûd bigire û ji bona hînkirin, pêşxistin û perwerdekirina zimanê xwe bixebitîne. Ev bi xwe vatinîyek merivayeti û neteweti ye. Her kesê ku hestek wî ya piçûk jî ya neteweti hebe, di bin şertên gelek zor da be jî wê zimanê xwe hîn be û bi zarokên xwe bide hîn kirin.

Lê mafê tu kesî tune ye ku li ser navê kurdan, li ser navê rewşenbîrî, demokrasi, pêşkeftîbûnîyê û hwd, ku van qanûnên nijadperest, hov û kevne-perest wek gavên pêşkeftîyên girîng, şoreş, nasîna gelê kurd û hwd. nişan bide. Dîsa ne pêwist e ku li ser navê kurdan şahî û çepik û dîlan ji van qanûnên nijadperest re bî li dar xistin.





## DI MESLEKÊ CIWANAN DE ROLA DÊ Û BAVÊ

### X. Uso

Di warê perwerdeyî de, ji bo zarok (ciwan) serfiraz bin û meslekekî baş bibijêrin, îdeolojî, pîvana çanda malbatê, têkelî û peywendîya dê û bav ya bi ciwanan re gellek grînge.

Gava ku zarok ji dêya xwe çêdibe, ne xwediyê bîrbirin û zanînekê ye. Ji bo hînbûna her lebatê pêşî mirovan textîl dike. Zarok, bandûra herî girîng ji dê û bavê xwe digire. Dê û bav, zanîn, lênerîn û bawerîya xwe, derbasî zarokên xwe dike. Gotinek pêşîyên me Kurdan heye: "Mal dibistan e!" Zarok, zanîn, çand, ehlaq, bawerî, terbiye, başî û xerabî û gelek tiştên din pêşî ji dê û bavê xwe hîn dibe.

Ji bo ku pêşî zarok ne xwediyê tu zanîne ye, dê û bav çawa tevdigere û çî dibêje zarok jî bi daxwaz wana dipejirîne û pêk tîne; ev jî pirrê daran dibe egera xwexapandina dê û bav ku zarok wek kopîyak xwe dibînin: loma zen dikin ku ew çî bifikirin, an bixwazin, an ew bi hiş, jîr û jêhatî bin, wê zarokên wan jî werê bin, na, ew nezan, teral û xerab bin dê zarokên wan jî werê bin.

Carina jî kompleksên psîkolojîk yê dê û bav derdikevin pêş: hin dê û bav, difikirin ku ew xwediyê çî kar û meslekî ne, divê zarokên wan jî xwediyê wî kar û meslekî be; hin dê û bav dibênin ku: "Em nebûn tiştek, ma wê zarokên me bi çî bin!?" hin dê û bav jî, di jiyana xwe de, tiştê ku xwestibe bibe û nebûbe, an ji kîjan makam û meslekî re heyrantiya wan çê bûbe, bi israr dixwazin zarokên wan bibin xwediyê wî meslekî.

Carina zarok jî meyila wan li ser daxwaz, kiryar û kar û barê dê û bavên wan heye û li gorî daxwaza dê û bav dibin xwediyê meslekekî; lê hertim ev werê naçe: gava kêfa zarok ji meslekê dê û bav re neyê û tiştekî din bala zarok bikişîne, lê dê û bav guh nede daxwaza zarok û jê re bibe asteng, wê gavê dibin egerê neserfirazî û dilsarbûna zarok ji xwendin, an ji kar û xebatê.

Gava dê û bavên ne xwediyê tu karekî bi wesif be, xwe kêma û biçûk his bikin û bifikirin ku ew nebûn tiştek, zarokên wan jî nabin tiştek û bi vê egerê guh nedin tu daxwaz û kiryarên zarokên xwe, tenê bi kiryar û jiyana xwe ve têkildar bin, zarokên xwe bera kuçan din, tiştekî neyê hesabên wan jî li hemberî zarokên xwe şiddetê bikar bînin, dibin egerê ku zarokên wan nexwendî, nezan, bêmeslek, serserî an krîmînal bibin.

Dê û bavê, kar û meslekên di serên xwe de îdealîze kiribin û heyrantiya wan jê re çêbûbe ku bi israr bixwazin zarokên wan jî bibin xwediyê wî meslekî, lê zarokên wan wêna nexwaze û li hember zarokên xwe têkevin hundir reaksiyonekê, an têkevin bawerîya ku zarokên wan nabin tu tiştek, ew jî dibin egerê pirsgirêk, xemgînî û neserfirazîya zarokên xwe.

Bandorek biyanîti an biyanîyan jî li ser dê û bav û zarokan heye: dê û bavê ku wek karker an penaber hatibe welatên biyanî, bi gelemperî, di hinek waran de xwe kêma, an xwe bi temamî li dervî civaka biyanî dibînin; ev jî di warê lênerîna perwerdekirin, kar û meslekê zarokên wan de dibe egerê lênerîn û helwestên şaş.





Civaka Ewropî jî, bi gelemperî, bi çavekî kêm û şûndemayî li biyanîyan dinêrin: li gorî wan, ewçend şens û qabîliyeta biyanîyan tune ye ku biçin dibistanên bilind û zanîngehan û bibin xwedîyê meslekên bi kalîte; loma li gorî wan divê zarokên biyanîyan bixebitin ku meslekên nizm û sektora xizmetê bidest bixin ku pirr mejî bikaranîn û xwendin jê re ne pêwîst be.

Erê, dê û bav zarokan tine dinyayê, lê dê û bav divê pêşî vêna bipejirîne ku di warê hiş, xwîy, kesayetî, tevger û daxwazê û hwd. de zarok mirovek bi serê xwe ye.

Ku kêmanî û seqetiyek bedenê tune be, ferqa zarokê mere, ji yê xelkê nîne.

Di warê terbiyê, zanîn, xwendin kar û meslek de, meriv berpîrsiyar e ku zarokên xwe agahdar û

perwerde bike, lê ne rast e ku meriv bi zorê, daxwaz û lênerînên xwe, bi zarokên xwe bide pejirandin.

Divê heta mumkun be, meriv bi pîvana ku zarok bixwazin, meriv têkelî xwendin û perwerdeya zarokên xwe bibe.

Ku wan meslekek bijartibe, divê meriv şewka wan neşikîne, lê nebijartibin û alîkarîya meriv bixwazin, divê li gorî zanîna xwe meriv alîkarîya wan bike.

Ya bi rastî jî, gava ku mirov ji dil û bi kêfa xwe meslek an karekî bibijêre, kalîta wî karî ji bo merivên din çî dibe bila bibe, ji bo meriv, ew kar herî di cîh de ye û bi kalîte ye. Ya herî grîng ku meriv bi daxwaza xwe tevbigere.



## DI NAV MALBATÊN KURDAN DE BI GELEMPERÎ AZADÎYA KEÇ Û KURAN

### X. Uso

#### REWŞA DÎROKÎ YA GELEMPERÎ

Ji bo ku em di derbarê mijarê de nîrxandinek rast bikin û bigehîjin encamek rast, divê li gorî hinek lêkolînên dîroka mirovahîyê yê antropolojîk, em bi kinahî daxwaniya rewşa peywendîya jin û mêr ya dîrokî bikin:

Serdema civakîya kevnar ya ku mulkîyeta civakî lê serwer e, li civakê erka jinê derbas dibe: jê re serdema Maderşahî (matrîyarkal) tê gotin. Dol bi navê jinê tê ajotin. Malbat bi navê jinê tê naskirin. Mîras li ser navê jinê tê ajotin. Zewaca civakî, ya hemdemî (qirne), ya navxweyî (endogamî), ya derveyî (egzogamî), ya duserkêşî şeweyên zewacê yê serdema maderşahîyê ne.

Serdema ku mulkîyeta şexsî li civakê dest pê dibe û serwer dibe, li ser civakê erka mêr dest pê dibe. Ji vê re jî serdema Pedersahî (patrîyarkal) tê gotin. Êdî zewaca mêr û jin dest pê dibe. Jin dikeve bin nîrê mêr. Di hundir malê de jin ne xwediyê mal û milk û zarokan e. Êdî jin di bin biryar û fermana mêr de tevdigere. Mafê mîrasa zarokan ji dê derbasî bav dibe. Di civakê de newekhevîya pêşî di nav jin û mêr û loma dinav keç û kur de dest pê dibe. Bi hezaran salan, her ku mulkîyeta şexsî berdewam dibe û li gorî pêwendîyên aborî çendîn sazûman tîn guhertin û pêşveçûn çêdibin jî ev newekhevî bi awayên cuda berdewam dibe.

Hetanî sazûmana sermîyandar (kapîtalîst) ya lîberal, di huqûqê, civak, dîn û dewletê de jî bi her warî mêr an kur di ser jin an keçê re hatiye girtin, jin û keç wek sinifê duyem hatiye dîtin. Lê bi geşbûnîya aborîya kapîtalîzma lîberal re, pêwîstîya beşdarîya jinan ya berhimandinê, di hemû warî de kar û xizmet û rêvebirina civakê û xerckirina berhemên sermîyandar derket pêş.

Di vê sazûmanê de, her çend jin wek nesnakî cinsî (seksê) hat kirin û firotin, bi vî alîyê xwe wek pergalekî reklaman hat bikaranîn, lê di warê huqûqê dewletê û saziyên fermî bi awakî relatîf wek mêr an kur, maf ji jinê re jî hatiye naskirin. Lê dîsa jî em li gelek saziyê fermî û civakî dinêrin ku di hejmarê jinan an keç û kuran de cudahîyek mezin heye.

#### DI CIVAKA KURD DE REWŞA JIN Û MÊR

Civaka Kurd, li her çar parçên Kurdistanê, her çend sermîyandarîyek ji derve hatibe û bi vîna bûbe xwediyê peywendîyên sermîyandarîyê jî, di warê peywendîyên civakî de, hîna çand û huqûqê serdema navîn, yê feodalî û dînî serwer e. Ji bo ku jiyana civakê li gorî vî huqûqê kevnar saz bûye, ev jî li gorî tevgera îro, bi xwe re gelek nakokî û pirsgerêkên civakî û malbatî çêdike.

Li gorî vî huqûqî, di malbatê de mulkîyet ya mêr e û tevgera aborî di bin fermana mêr de ye. Mêr serdar û malxwê ye. Bi gelemperî watinîya jinê, kar û barê nav malê bike, zaroka bîne û wan xwedî bike, ji rêz û fermana mêr dernekeve. Jin namûsa malbatê ye, yanî malê mêr an malbatê ye. Ku ji dervî daxwaza mêr tevbigere an kêfa mêr ji tevgerek wê re neyê, mafê mêr heye ku bi şiddet wê ceza bike. Mêr dikane bi jinekê re têkelî deyne an jinek duyem bîne, lê jin bi mêrekî re têkelî deyne an bireve, kuştinê heq dibe.



## DI CIVAKA KURD DE REWŞA KEÇAN YA CUDA

Ji dervî hinek îstîsna, di malbatên Kurdan de rewşa keç û kur, li gorî quqûqê jin û mêr saz bûye. Her çend qanûnên dewletan, mafê mîrasê ji keçan re naskiribe jî, wek mînak di civaka Kurd de bi gelemperî hîna şermek mezine ku keç daxwaza mîrasa bavê xwe bike. Keç, li gorî çanda feodal, îslamî û pedersahîyê tê mezinkirin. Divê ji gotina dê û bavê xwe dernekeve, li malê li ber destê dêya xwe be û xizmeta hemû endamên malbatê bike. Karê wê û yê kuran ne yek e: hemû karên nav malê çawa watiniya dayikê ye ku pêk bîne, ya keçê ye jî. Divê xizmeta kurukan jî bike. Gava ku keç ji dervî çanda malbatê derkeve, piranî bi şiddet tê cezakirin.

Mafê keçan tune ye ku mîna kuran bi serbestî dibistanê bixwîne.

Keç bi kêf û daxwaza xwe nikanin biçin der, an li çarçiyê bigerin.

Keç li gorî daxwaza xwe nikane bi kur, an bi her keçê re hevaltî bike.

Keç li gorî daxwaza xwe nikane cil bikire an modela cilan bibijêre.

Keç nikane li gorî daxwaza xwe porê xwe biquşîne û modelekê bide porê xwe.

Keç nikane ji bo xwe biryara zewacê bide û wê bi kê re bizewice.

Keç nikane bi mêran re têkeve birkê, an deryayê.

Keç bi serê xwe, an bi hevalan re nikane biçe tatîlê.

Keç nikane mîna kur li civatê bipeyive.

Keç nikane bi yekî dervî malbatê re rûnê û sohbetê bike.

Keç nikane diyariyekê bide xortekî, an jê bigire.

Keç nikane bi serê xwe biçe çalakî, meşîn, pêşandan, dawet, şev an şahîyekê.

Keç nikane bi serê xwe biryara kirina meslekekî, an çûna karekî bide.

Keç bi serê xwe nikane bibe endamê rêxistin an sazîyekê.

Xweh nikane birê xwe bisuxirîne, lê bira dikane xweha xwe bisuxirîne.

Keç û law li ba hev be, bav an dê, keçê disuxirînin.

Karê mal hebe, kur kane di xew de bimîne, lê keç nikane.

Keç divê bi terbiye rûnê, rabe û bimeşe....

Di malbatên Kurd yê li Ewropa, rewşa jin an keçan li gorî welat belkî çenekî çêtir e. Rewşa jin û keçan ya li malbatên pêşverû jî çêtir in ji yê din. Lê armanc, ne yek yek malbatên Kurd lê em bi gelemperî rewşa keç û kurên Kurd dixwazin deynin holê.

## ÇARESERÎ

Bingeha azadîya mirovan aborî ye. Jin û mêr, an keç û kur ji bo bibe xwediyên yek mafî, divê pêşî di warê aborî de xwediyê yek mafî bin.

Divê keç, mîna kur xwediyê mafê mîrasê be. Ger bav û bira ne terefdarê vêna be jî, divê keç bi israr vî mafî bixwaze. Divê keç jî, ji bo beşdarîya hemû karên civakî bête perwerdekirin û bibe xwediyê meslekekî. Divê keç di xwendin û kirina karekî de israr bike.

Divê keç an kur, di derbarê çareserîya pirsgerîkan de, bi dê û bavê xwe re li rêya diyalogê bigerin û bipeyivin. Divê ciwan li gorî normên civak û malbatê hinek berpirsîyarîyên pêwîst pêk bînin. Divê ciwan di sazîyên civakî û netewî de cîh bigirin û beşdarî çalakîyan bibin. Zewacek bê dil û daxwaza ciwanan be, bi çî awayî be, divê red bikin.





## VOORWOORD

Beste lezers,

Om haar bestaan te kunnen verdedigen en voort te zetten, heeft iedere organisatie diverse primaire activiteiten en werkzaamheden nodig. Deze activiteiten moeten betrekking hebben tot de visie van de organisatie en moet daarnaast de organisatie helpen met het bereiken van hun doelstellingen. Zolang er behoefte is aan het bestaan van een organisatie, zal de organisatie deze werkzaamheden en activiteiten voort moeten zetten. Op deze manier zal de desbetreffende organisatie haar bestaan kunnen behouden en voortzetten. Maar wanneer deze primaire werkzaamheden niet voldoende meer zijn om de organisatie draaiend te kunnen houden, zal het uiteraard niet lang meer duren voordat zo'n organisatie helemaal verdwijnt.

De tijd staat nooit stil en brengt steeds nieuwe levensbehoeftes met zich mee; behoeftes die nodig zijn om te kunnen overleven. Deze realiteit geldt voor iedereen en dus ook voor organisaties. Voor organisaties is publicatie tegenwoordig één van de belangrijkste overlevingsbronnen geworden.

Aan deze realiteit kon ook onze vereniging, De Koerdische Arbeiders en Cultuur Vereniging (KOÇ-KAK), niet ontkomen. Voor het behouden van contacten met onze doelgroep en om ze beter te kunnen bereiken, is het ook voor ons noodzakelijk geworden om meer aandacht aan publicatie te besteden. Om onze ervaringen en standpunten over bepaalde zaken, met zoveel mogelijk Koerden te kunnen delen, is de publicatie een onmisbaar realiteit voor ons geworden. Wat deze kwestie betreft, heeft (KOÇ-KAK), met het openen van het internet website [www.nistiman.com](http://www.nistiman.com), voor Koerdische jongeren, de eerste stap gezet. Nu zet (KOÇ-KAK) met dit tijdschrift, dat om de drie maanden zal verschijnen, haar tweede stap.

Qua inhoud zal het tijdschrift grotendeels informatief zijn. Het zal niet alleen de activiteiten van de vereniging (KOÇ-KAK) bevatten, maar ook allerlei soorten informatie over de gebeurtenissen en de ontwikkelingen die de lezers wel aangaat. Het zal ook aandacht besteden aan artikelen, recensies en degelijke die met ons volk en land te maken hebben. Als principe zal het tijdschrift half Koerdisch en half Nederlands zijn. Afhankelijk van de aanwezige hoeveelheid informatie kunnen de verhoudingen tussen Nederlandse of Koerdische tekst, per nummer verschillen.

Als vereniging zijn we voor het uitgeven en voortzetten van dit tijdschrift optimistisch en vastbesloten. Aan de hand van de mogelijkheden die we hebben, zullen we ons best doen om de kwaliteit van dit tijdschrift steeds te verhogen. Maar het is belangrijk om dit feit te noemen: het bestaan van een tijdschrift is grotendeels afhankelijk van de houding en de steun van haar lezers. Dus we rekenen erop; dat u over bepaalde onderwerpen uw eigen idee, opvatting en/of commentaar, informatie over de belangrijke gebeurtenissen in uw omgeving en uw kritiek over allerlei onderwerpen waar we mee bezig zijn naar ons toestuurt. Het zal ook heel veel steun betekenen als u uw vrienden en kennissen op de hoogte stelt van het bestaan van dit tijdschrift.

REDACTIE



## GESCHIEDENIS VAN KOÇ-KAK

In het jaar 1985 kwamen wij samen met een aantal vrienden als politieke vluchtelingen naar Nederland. Vanwege onze politieke ideeën en opvattingen moesten we noodgedwongen ons land ontvluchten. Verblijf had hoogstwaarschijnlijk tot onze vervolging, opsluiting of marteling geleid.

Er zijn verschillende redenen waarom er juist rond die tijd grote delen van de Koerdische gemeenschap besloten hadden om hun land te verlaten en naar Europa te vertrekken. Sommigen vanwege hun politieke ideeën en andere waren weer vanwege het tekort aan werkgelegenheid in hun eigen land op zoek naar werk. De geschiedenis van de Koerden in Europa is natuurlijk ook een zeer interessant onderwerp, waar we zeker in de toekomst de nodige aandacht aan zullen besteden.

Het was kort na de militaire staatsgreep van 12 september 1980. De pijn en wonden die dit brute dictatoriale Turkse regime op de Koerdische gemeenschap had achtergelaten waren nog vers in het geheugen. Hoewel een redelijk grote deel van de Koerden al ruim voor de staatsgreep in Europa verbleef, hadden de gevolgen van de staatsgreep en de problemen die ons land ondervond wel degelijk invloed op de Koerden in Europa. Bijna iedere Koerd in Europa, had wel een familielid die was gemarteld of anders vastzat in de gevangenis. Dit alles had als gevolg dat binnen de Koerdische gemeenschap de drang naar vrijheid en beweging sterk toenam.

De Koerdische gemeenschap, was en behoort nog steeds tot één van de grootste migranten groepen in Europa. De Koerdische gemeenschap was voor vele jaren niet goed georganiseerd. Het grootste deel van de Koerdische gemeenschap kwam vanuit Noord Koerdistan als gastarbeiders en in het kader van gezinsherenigingen naar Nederland. In Nederland bestonden er in die tijd haast geen Koerdische verenigingen. Hierdoor waren veel Koerden o.a vanwege het gebrek aan kennis van de Nederlandse taal in Turkse organisaties actief en zochten daar de oplossingen voor hun maatschappelijke problemen.

Dit was voor ons het moment waarop we 17 jaar geleden de Koerdische Arbeiders en Cultuur Vereniging ((KOÇ-KAK)) in Nederland hadden opgericht. Nu hoefden Koerden niet meer voor hun problemen bij Turkse organisaties aan de deur te kloppen.

